Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar :1022 | 14-Kanûn- 2022 | www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/ nameronahi@gmail.com 423165

# Li Rojava '2 atolye, 2 lîstik'

**Komuna Şano ya Rojava li gel Şanoya Çiya ya ser bi Tev-Çandê, projeya '2 Atolye, 2 lîstik' bi serketî bi cih anî.**



Şanogerên Rojava ku perwerde, rêxistinî û karê hunerê danîne pêşiya xwe, projeyên xwe li gel zor û zehmetiyan gav bi gav pêk tînin.
Şanogerên li vê qadê xwe dispêrin hêza xwe, keda ciwanên Rojavayî û bi perwerdeyê, bi zanebûn û bawerî karên ji bo sala 45'an a PKK'ê amade kirin, pêşkêşî temaşevanan kirin. Li gel afirandina berhemên şanoyê, ji bo fêhmkirina dîroka partiyê ya bi rengekî rast û bicihanîna wê, mohra xwe danîn binê 2 lîstikên serketî. Bi rêya vê projeyê ciwan hatin perwerdekirin, bi rêxistinkirin û çalakkirin. Şanogerên Rojavayî li gel gef û guregura şer, bi derengî jî be bi azad û wêrekî lîstikên xwe pêşkêş kirin. Ne tenê lîstin, her wiha ji bo jinûve avakirina jiyanê zend û bend ba dan, hilberandin û li dora nirxan li hev civiyan.

### 2 ATOLYE

Ciwanên ku li bajarên Qamişlo û Dêrikê li hev kom bûn û yekemcar di şano û hunerê de cih girtin, beşdarî atolyeyên ji dersên senaryo û kamerayê bûn. Nêzî 50 kes tevlî atolyeyan bûn. Piştî perwerdeya ji mehekê zend û bend ba dan û ji bo sala 45'an a PKK'ê 2 lîstik amade kirin. Di herdu lîstikan de ku ji aliyê Şanoya Çiya ve hatin nivîsandin, qala dîroka PKK'ê hate kirin.

### LÎSTIKA DESTPÊKÊ

Du lîstikên cuda yên ji aliyê Şanoya Çiya ve hatin nivîsandin, ji aliyê şagirtên atolyeyên Qamişlo û Dêrikê ve bi ked û hewldaneke mezin li ser dikê hatin lîstin. Herdu lîstik bi navê Rastî Dagirkirî ye û Dara Jiyanê hatin pênasekirin. Di lîsetika destpêkê de qala berxwedana Sêwerekê ya beriya 1980'î dike ku bi pêşengiya yek ji kadroyên destpêkê yên PKK'ê Salîh Kandala mohra xwe li dîroka PKK'ê xistiye. Pêvajoyeke welê vedibêje, ku di bin zext û zordariya sîstema axatinê de kadroyên koma destpêkê berxwedana Sêweregê bi rêxistin dikin. Berxwedana ku piştî şehadeta Hakî Karker di dîroka têkoşîna çekdarî ya PKK'ê de xwedî cihekî girîng e, ji aliyê komeke şano ya nêzî 30 kesî li ser dikê hate nîşandan. Lîstik qala wan salan e ku li dijî paşverûtiya noker û zilma dewleta Tirk, arêşa azadiyê şîn dibe. Pêvajoya ragihandina PKK'ê jî ji çavê peykeltraşekî ve tê nîşandan. Lîstika ku kesayeteke şoreşger dide nas kirin ku li Hîlwan û Sêweregê gel û sempatîzanên PKK'ê heta dawiyê jê bawer dikin, pêvajoya vê çalakiya bi bandor a li nava civakê deng veda, radixe pêş çavên temaşevanan. Lîstik beriya bi salan ji aliyê Ş. Hêvî Şanoger ve hate nivîsandin û lîstin. Vê carê jî ji aliyê hunermendê Rojavayî, derhêner û perwerdekar Kawa Fettah ve hate amadekirin û pêşkêşî temaşevanan hate kirin.

### LÎSTIKA DUYEMÎN LI SER PÊVAJOYA KONGREYA DESTPÊKÊ YE

Lîstika duyemîn, çîroka Dara Jiyanê jî kevn e, lê belê senaryoya wê nû hatiye nivîsandin. Lîstika ku sala 2017'an ji aliyê Şanoya Çiya ve hate nivîsandin, qala kongreya destpêkê ya salên 1978'an a damezrandina PKK'ê dike. Lîstika Dara Jiyanê helbesta Dara Pîr a helbestvanê Rojhilatî Cemal Melîkşa û pêvajoya ji şahîdiya Malbata Zogûrlû, yanî mala ku PKK lê ava bû, digihîne hev. Li ser bingeheke xurt a felsefîk hatiye rûniştandin. Lîstika ku li ser bingeha pîvanên diyalektîk ên başînebaşî, doh-îro, xwecihî-gerdûnî hatiye rûniştandin, li hewşa mala Malbata Zogûrlû derbas dibe. Li hemberî daxwaza keyayê gund a ji bo birîna dara li hewşa mala ku PKK lê ava bibe, qala berxwedana dayika Seyfettîn Zogûrlû dike. Wê pêvajoyê vedibêje ku Apoyî ji bo civînê wê malê hildibijêrin û têne wê malê. Lîstik qala wê yekê dike bê dayika Îsmet çawa Mazlûm Dogan, Sakîne Cansiz (Sara), Dûran Kalkan (Abbas), Cemîl Bayik (Cûma) nas dike, bi rengekî veşartî deriyê mala xwe li Apoyiyan vedike, çawa Rêber Apo nas dike, hezkirina wê ya ji kadroyên Apoyî re, di heman demê de çawa dara li hewşê diparêze. Lîstika ku ji aliyê Şanoya Çiya ve hate amadekirin qala salên destpêkê dike.

### WÊ LI QADA DÎJÎTAL JÎ BÊ NÎŞANDAN

Herdu lîstikên ku ji aliyê Komîna Fîlma Rojava û Nefel Produksiyon ve hatin kişandin wê di demeke kurt de bikeve ser medya dîjîtal jî û ji aliyê gel ve bê temaşekirin.
Lîstikên ku diviyabû 27'ê Mijdarê pêşkêşî gel bihatina kirin, ji ber êrîşên hewayî yên dewleta Tirk û şehadetan, ji bo hefteyekê hate taloqkirin û bi derengî hatin nîşandan. Herdu lîstik wê rojên bê di serî de li Qamişlo, Dêrik û Rimêlanê wê li gelek deveran bêne nîşandan. *-ANF*

# Hemû amûrên kevnar ji bo parastina çanda Kurdî diparêze

**Necîme Rûbîten jinek Germiyanî ye, ji bo dîroka çanda kevin a Kurdî biparêze, hemû amûr û kel û pelên ku di demên kevin de dihatin bikaranîn li mala xwe kom kirine.**

Jin-dayik rêvebera herî sereke ya jiyan, çand û çandiniyê ye. Di hemû karan de her dem pêşengî kiriye, di serdemên kevin de her çendî ne hêsan bû jî lê belê jinan pişta xwe dida hêza xwe û ji nebûnê hebûn ava dikirin. Bi destên xwe amêrên karkirinê çêkirine û heta niha jî ev yek di nava Kurdan de maye û bûye beşek ji dîrok û çanda jinên Kurd.
Yek ji wan jinên bi hêz ku ji berê ve di karkirin û alîkariyê de xwedî hêzek zêde bû Necîme Rûbîten e ku ji aliyê xelkê gundê wê ve weke Hacî Necîme tê nasîn. Jinek 85 salî ye û ev nêzî 50 salan e li gundê Banexan ê Germiyanê dijî. Weke bi xwe jî behs dike heta beriya çend salan jî karê gund ê weke çandinî, lawirvanî û karên destan dikir lê belê niha ji ber temenê mezin, hêza wê ya van karan nemaye.

### 'Jiyana berê li gora niha gelek xweş bû'

Hacî Necîme da zanîn ku destpêkê li bajar bûne lê belê ji ber nebûna çandinî û zoriyên jiyanê vegeriyane gund û wiha got: "Jiyan berê her çendî zehmet û westandina wê zêde bû jî lê belê ji ya niha xweştir bû. Ji ber ku têkiliyên civakî û xizmet germtir bû, niha her çendî asankarî zêdetir bûye jî ji ber amûrên elektronîk, têkiliyên civakî nemane.
Hacî Necîma behsa karên destan dike ew amûrên ku kar pê dikir weke ferş ku li mala xwe ji bo ciwaniyê di hilawestin muxel û gêrise û hwd. wiha got: "Ev ferşe min beriya 40 salan bi destên xwe û bi keda xwe çêkir. Dema ciwan bûm, me berê gêrise bi kar dianî ji bo çêkirina dan û piştî ku me danê xwe hûr dikir, me dikir xwarin, ev gêrise ne tenê ji bo min bû xelkê gund piranî dihatin ji bo karê xwe bi kar dinîn. Ew xwarina ku me bi vê gêrisê amade dikir, tam û bêhna wê ji xwarinên niha tê çêkirin gelek xweştir bû."
Necîme Rûbîten wiha behsa werîsê ku bi destê xwe çêkiriye kir û got: "Ev werîs min ji hiriya bizinan çêkiriye û ji bo kişandia tiştan û girêdana lawiran em bi kar tînin. Her wiha em muxilê jî ji bo paqijkirina dan û tiştên din bi kar tînin. Dema ku me danê xwe paqij kir bi gêrisê me hûr dikir, dem ku cotyaran kar dikir



me jinan xwarin amade dikir û di sifreya fafînê de me xwarin dibir ji wan re."

Her wiha Necîma behsa sindoqê kir û wiha got: "Ev sindoq ji bo parastina cil û bergan di demên kevin de dihat bikaranîn, ew sindoq ji dema kevin heta niha maye û niha min rûnê xwarinê xistiye navê û rakiriye."

### 'Di demên borî de xelkê her dem bi hev re kar dikir'

Necîme Rûbîten dibêje ku bikaranîna amûrên berê her çendî giran be jî lê belê xweş bû yên niha her çendî hêsan in jî tu xweşiya wan nîn e û wiha got: "Me berê bi hev re kar dikir û em bi hev re kom dibûn me karê dirûtina genim û ceh di werza havînê de bi hev re dikir, bê pere me alîkariya hev dikir. Lê belê niha ev hevkarî nemaye kes bê pere alîkariya kesê nake."
***JİNHA***

Sudoku:Pirs 32

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| | | 5 | | 8 | 3 | | | |
| | | | | | | 4 | | 2 |
| | 1 | 9 | | | 4 | | | 5 |
| 9 | | 4 | | | 7 | | 1 | |
| 1 | | | 4 | | 9 | | | 8 |
| | 3 | | 8 | | | 9 | | 6 |
| 3 | | | 1 | | | 7 | 8 | |
| 5 | | 1 | | | | | | |
| | | | 6 | 4 | | 3 | | |

Sudoku: Bersiv 31

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 6 | 1 | 2 | 5 | 7 | 9 | 8 | 3 | 4 |
| 3 | 5 | 4 | 6 | 2 | 8 | 1 | 7 | 9 |
| 9 | 8 | 7 | 1 | 4 | 3 | 5 | 6 | 2 |
| 4 | 7 | 1 | 2 | 6 | 5 | 3 | 9 | 8 |
| 2 | 3 | 9 | 8 | 1 | 7 | 4 | 5 | 6 |
| 5 | 6 | 8 | 3 | 9 | 4 | 2 | 1 | 7 |
| 7 | 2 | 3 | 4 | 5 | 6 | 9 | 8 | 1 |
| 8 | 4 | 6 | 9 | 3 | 1 | 7 | 2 | 5 |
| 1 | 9 | 5 | 7 | 8 | 2 | 6 | 4 | 3 |

## Quncika Têgînan

| Damezirandin | Avakirin, sazkirin: Salvegera damezirandina Komara Kurdistanê. |
|---|---|
| Damezirîner | Kesê ava kirî: Damezirînerê komarê li meclisê sond xwar. |
| Diyarker | 1. Kesê ku tiştekî dide zanîn. Xuyaker, ronker, zelalker, ragihîner. 2. Kesê yan tişta bingehî. |
| Hevrê | Kesên ku hizir û baweriya wan weke hev. Bi taybetî di siyasetê de. |
| Mayînde | Tişta ku demdirêj dimîne. Xurt, qayîm. |
| Pejirandin | Qebûlkirin. Pejirand, ango qebûl kir. |
| Rêxistin | Komek mirovên ji bo heman armancê bi hev re dixebitin. Organîzasyon, sazûman, teşkilat, kom, partî, hizb: |
| Senato (Îtalî) | Li hin welatan li gorî temen û perwerdeya endamên parlamentoyê, meclisa hatî avakirin. Ciyê ku senator lê kom dibin. |
| Senator (Îtalî) | Endamê senatoyê. |
| Tengav | 1. Ciyê teng yê av tê re derbas dibe. 2. Kesê ji bo tiştekî ketî tengiyê: Ez ji bêperetî tengav bûme. 3. Kesê destava wî ya piçûk tê. |



## Dîmenê termê leşkerê bi navê Mûstafa Bazna hat weşandin

Gerîla TV dîmenê termê leşkerê dagirker yê bi navê Mûstafa Bazna weşand û bîr xist ku ev leşker li Qada Berxwedanê ya Girê Fm a Metînayê de hatibû cezakirin. ***R-5***

Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar : 1022 | 14-Kanûn- 2022 | www.ronahi.net/ku/

# LI ŞÛNA ÇARESERIYÊ DARVE DIKE!



## Rejima Îran'ê her roj ciwanekî bidarve dike

Rejîma Îranê piştî darvekirina Mohsen Şekarî, serê sibeha 12 mehê ciwanê bi navê Mecîd Riza Rehneverd jî darve kir. ***R-3***






## Hêviya xwe bir sêdarê!

Rejîma Îranê li hember serhildanên li Rojhilatê Kurdistanê û li Îranê berê xwe dide bidarvekirina bêhtir mirovan. Ji bo çavên gel bişikîne, xelkê çavtirsandî bike, bi tirsê pêla serhildanê sar bike, êşkence û bidarvekirinan zêde dike.

## Rewşa Cîhanê Ya Roja Me Ya Îro Rewşa Emperyalîzmê Ye

Ji bo fêmkirina vê tevgera antî-şoreşgerî ku bi pêşengiya DYE'ê, divê rewşa ku emperyalîzmê di nav de bû hê ji nêz ve were dîtin.***R-4***



## 'Ji bo azadiya Rêber Apo em ê şev û roja xwe bikin yek'



Jinên bajarê Qamişlo tecrîda girankirî ya li ser Rêberê gelê Kurd Abdullah Ocalan şermezar kirin û gotin, tecrîda li ser Rêber Apo binpêkirina mafên mirovahiyê ye û sucê herî mezin e. Heta ku em Rêbertî di nav xwe de azad nebînin, em ê her li kolanan bin û doza azadiya Rêberê xwe bikin. ***R-2***


## HPG: 4 dagirker hatin cezakirin



HPG'ê ragehand ku di encama calakiyên hêzên wan de 4 leşkerên Tirk ên dagirker hate cezakirin û yek jî birîndar bû û got, dagirkeran 12 caran bi çekên kîmyewî û 2 caran jî bi bombeyên qedexe êrîşî qadên gerîla kir. ***R-3***

## Bilindbûna bihayê xwerekan û sedemên wê

***R-6***



Zozan CIZÎRÎ
GELÊ BI AZADIYÊ VEJIYA YÎ
*R-2*



Zekî Bedran
Êrîşa li ser Sûrî wê bi ...
*R-5*

# 'Ji bo azadiya Rêber Apo em ê şev û roja xwe bikin yek'

**Jinên bajarê Qamişlo tecrîda girankirî ya li ser Rêberê gelê Kurd Abdullah Ocalan şermezar kirin û gotin, tecrîda li ser Rêber Apo binpêkirina mafên mirovahiyê ye û sucê herî mezin e. Heta ku em Rêbertî di nav xwe de azad nebînin, em ê her li kolanan bin û doza azadiya Rêberê xwe bikin.**

**Darîn Silê/Qamişlo**

Ev 23 sal in, Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan li zindana Îmraliyê de dîl hatiye girtin û ev demek dirêje ti agahî di derheqê rewşa wî de nayên girtin. Ev jî gumanên gel zêde dike. Dewleta Tirk ya dagirker xwest di şexsê Rêbertî de îradeya gelê Kurd bişkîne. Ji bo wê jî 9 Cotmeha 1999'an dewleta Tirk û hêzên komploger Rêber Abdullah Ocalan bi komployekê revandin. Di fikrê dewleta Tirkiyê



de wiha bû ku wê ev roj bibe roja tinebûna tekoşina azadiya Kurdan. Lê ji roja ku komplo li ser Rêber Apo hat kirin û heta roja îro gelê kurd roj bi roj tekoşîna azadiyê xurttir kiriye. Rojane gelê kurd û tevayiya gelên li herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê, li kolanane û banga azadiya fîzîkî ya Rêber Abdulllah Ocalan dikin. Herwiha Netewa Demokratîk ya Rêber Apo bû alternatîfa sîstema desthilat ya kapîtalîst. Lewma li çar aliyê cîhanê gel û kesên demokrat û azadîxwaz wî wek rêberê xwe dibînin û dibêjin 'Rêber Apo ne tenê rêberê gelê kurd e ew rêberê me jî ye'. Ev yek jî dihêle ku hêzên komloger ji ber tirsa xwe hemû mafên mirovahiyê binpê bikin û vê tecrîdê bidomînin.

Derbarê tecrîda li ser Rêber Abdullah Ocalan, berdewamiya kompoyê heta roja îro û nenaskirina rewşa Rêbertiyê, Jinên bajarê Qamişlo ji me re axivîn û diyar kirin ku wê bi azadiya Rêber Apo her kes xwe azad bibîne, bi taybet gelê Kurd wê xewin û xeyalên xwe bi cî bîne.

### `Heta niha kompoyên li ser Kurdan berdewam in`

Jina bi navê Sîham Silêman da zanîn ku ji sedê salan e lîstikên qirêj û plan li ser kurdan çêdibin û axaftina xwe wiha domand: "Beriya komploya li ser Rêberê gelê kurd Abdullah Ocalan gelek kompoyên qirkirinê li ser Kurdan dihatin kirin. Herwiha hêzên komploger hewl didan ku hebûna Kurdan ji dîrokê rakin. Ji bo wê jî di şexsê Rêber Apo de komplo li ser Kurdan û li ser tevayiya







gelên bindest pêk anîn. Ev komplo kompoyek navneteweyî bû, ku gelek dewlet tê de hevkar bûn. Niha jî 23 sal di ser komloyê re derbas bûn û ketiye sala xwe ya 24`an de. Heta niha jî kompoyên li ser Kurdan berdewam in. Herwiha Tevayiya êriş û kiryarên ku li ser gelê herêmê bi taybet li ser jinan tên kirin berdewamiya Komploya Navneteweyî ne."

### `Em li ser fikrê Rêbertiyê şoreşa xwe bi rê ve dibin`

Sîham destnîşan kir ku fikir û felsefeya Rêber Apo hewldanên dewleta Tirk ya dagirker vala derdixîne û ev yek li axaftina xwe zêde kir: "Raste Rêberê gelê Kurd di zindanê de tecrîdeke giran li ser tê kirin, lê Kurd jî bi fikir û felsefeya Rêberê xwe dagirkeriya Tirk tengav dike. Roj bi roj planên Tirkiyê yên li hemberî Kurdan lawaz dibin. Şoreşa ku niha em tê de ne jî, bi saya fikir û felsefeya Rêber Ocalan dewam dike û wê bi saya fikrê wî jî bi ser bikeve. Di şoreşê de bi milyonan şagirtên Rêber Apo çêbûne û tev daxwaza azadiya wî dikin. Herwiha em li ser fikrê Rêbertiyê şoreşa xwe bi rê ve dibin. Ji bo wê jî şoreşa ku li ser fikrekî rast û dirust bimeşe, helbet wê serkeftî be."

### `Mafê me ye ku em rewşa Rêberê xwe nas bikin`

Sîham bîr xist ku demek dirêje ti agahî ji Rêbertî nehatine û wiha dirêjî da axaftina xwe: "Tevî tecrîda bi salan, demek dirêje Tirkiyê derfetê nade parêzer û malbata Rêbertî ku pêre biaxivin. Dewleta tirkî naxwaze hevdîtin çêbibin, lê li gorî pîvanên navnetewî yên mafê mirovan divê kesê ku di girtîgehê de rastî işkenceyê nebe. Herwiha mafê wî ye ku daxwaza hevdîtina malbat, parêzer û hevalên xwe bike û divê ji mafê xwe yê jiyanê qut nebe. Ji bo wê jî divê em bilez rewşa Rêberê xwe nas bikin."

Sîham Silêman di dawiya axaftina xwe de got, heta dilopek xwîn di laşê me de hebe emê piştgir û parastvanên doza azadiyê bin. Emê şev û roja xwe ji bo azadiya Rêberê APO bikin yek û doza rêberê xwe pêk bînin. Lewra doza wî doza me ye. Doza me jî azadî û serkeftine.


### `Em gihîştine qonaxa serkeftinê û ji serkevtinê bi paş ve naçin`

Jina bi navê Delal Bedûr jî teqez kir ku Tirkiyê çiqasî hewldanên xwe bi kar bîne ew nikare kurdan ji azadiyê dûr bixe û wiha pê da çû: "Tiştê ku Tirkiyê berî niha dikir îro nikare bike. Lewra kiryarên wê êdî nayên qebûlkirin û kurd jî ne kurdê berê ne. Em gihiştine astekê ber bi azadiyê ve. Em gihîştine qonaxa serkeftinê û ji serkevtinê bi paş ve naçin."

### `Kiryaran Tirkiyê vîn û îradeya gelê azadîxwaz naşkîne`

Delal di berdewamiya axaftina xwe de wiha got: "Ji ber ku plana kompoyê bi ser neket û Tirkiyê armanca xwe ya tinekirina kurdan pêk neanî, êdî Tirkiyê nizane ka bi çi awayî kurdan tine bike. Ji ber wê jî niha rojana êrişî kurdan û tevayiya pêkhateyên li herêmê yên ku li kêleka kurdan dixebitin dike. Hewl dide bi rêya êriş û balafirên xwe gelê herêmê yên ku li ser fikir û felsefeya Rêber Apo tev digere bişkîne û bitirsîne. Lê îradeya gelê azadîxwaz ne bi van kiryaran û ne jî bi şêwazên din nayê şikestin, bi taybet gelê kurd wê heta kêliya dawî di jiyana xwe de li ber xwe bide. Êdî ti kes zoriya hêza kurdan nabe, Yan serkeftin yan jî serkeftin. Ji bilî serkeftinê me tiştekî din nedaye ber çavên xwe."

Delal Bedûr di dawiyê de got, Wek gel û jinên bakur û rojhilatê Sûriyê emê her demê banga azadiya Rêberê xwe bikin, herwiha hêz û fikrê ku rêbertî di me çandiyê emê xurttir bikin û brxwedanê geştir bikin.



## GELÊ BI AZADIYÊ VEJIYA YÎ

**Zozan CIZÎRÎ**

Di dîrokê de her gelekî gava têkoşîna ji bo serxwebûna xwe meşandî, berdêlên giran dane, gelek şer, koçberî û malwêranî jiyan kirine. Û di encama têkoşîn û berxwedana salan de serxwebûna xwe bi dest xistine. Îro gel û pêkhateyên Rojavayê Kurdistanê jî qonaxeke wisa, lê ji ya gelên cîhanê hîn girantir jiyan dikin. Ji ber dijminê tu gelekî wekî dewleta Tirk a dagirker ji hestên mirovahiyê bêpar nebûye. Li gel dewleta Tirk a dagirker bi gotina herî rast xwediyê cewhereke şovenîst û barbariyeke bênimûne mijara gotinê ye. Êrîşên dewleta Tirk a dagirker û serkêşê wê yê dîktator Erdogan-Bahçelî terora herî mezin li ser gel û pêkhateyên vê herêma me ya Bakur-Rojhilatê Sûriyê dimeşînin, lê hêzên NATO, Neteweyên Yekbûyî û Yekîtiya Ewrûpa ji bo berjewendiyên xwe yên desthilatê bi awayê ku tevahî zagon û pîvanên mafê mirov binpê bikin, rojane çekên nû yên pêşketî difroşin vê dewleta dagirker û faşîst. Lewre bêdeng mayîna van hêzan a li hemberî êrîşên terorî û sixtekariyên dewleta Tirk tê fêmkirin. Lê divê em vê jî bînin bîra wan ku, ew di nezera gelê Kurd, Ereb û giştî pêkhateyên herêmê de berpirsên hemû malwêranî, komkujî, dagirkerî, talankirina erdên me yên bi destê çeteyên dewleta Tirk û çekên ku wana difroşin vê dewleta dagirker û qirker in.

Roja 5'ê Kanûnê ango berî hefteyekê dewleta Tirk a dagirker a li hemberî têkoşîna gelên Kurd, Ereb, Asûrî-Sûryan ên Bakur-Rojhilatê Sûriyê têk çûyî, vê carê erebeya karmendên Desteya Perwerde û Fêrkirinê ya Herêma Cizîrê kir hedef. Di vê bûyerê de dewleta Tirk dîsa çete û sîxurên xwe yên kirêgirtî xiste dewrê, wisa mayîn bi seyareya ku karmendên perwerdê dibir û dianî ve kiribûn û ev seyare di saeta kombûna karmendan de bi awayek hovane hate teqandin. Dîsa îro li Kobanê û gundê Ûm El-Kêf a girêdayî navçeya Tiltemir dibistanên zarokan kir hedef û bombe li ser wan barandin. Diyar e, serfermandarê artêşa dagirker Hulûsî Akar ê kîmyayî û şefê dîktator Erdogan wê dîsa derkevin pêş kamerayan û wekî her car gotinên xwe yên derew ku dibêjin, "artêşa me tu caran zarokan, sivîlan, cihên medeniyan nake hedef!" dubare bikin. Lê êdî derewên wan jî genî bûne. Encex wekî li ser lewheya dibistanê mayî, zarokên vî gelî wê bi fikra "ZAFERA RAST, ZAFERA LI HEMBERÎ CEHALETÊ TÊ QEZENÇKIRIN E" her tim li ber xwe bidin û cehaleta bermayên EBÛ CEHÎL bi tîrên zanista azadî, wekhevî, demokrasî û serfiraziyê têk bibin.

Di vir de heqîqetek heye ku, gel û pêkhateyên Rojavayê Kurdistanê û Bakur-Rojhilatê Sûriyê tevî zarok, jin, zilam tevahî însanên xwe di encama serkeftina Şoreşa 19'ê Tîrmehê de bi hesta azadiyê vejiyan. Cara yekê rêveberiyek bi îradeya xwe saz kirin, pişta xwe bi ciwan û cengawerên xwe rast kirin. Tevî hinek kêmasiyên pratîk jî, gel rojane bi keda xwe, bi zanist û perwerdeya xwe pêşve diçe, serkeftina xwe misoger dike. Sekna vî gelî remza aştî, azadî û aramiyê ye. Lewre îro dengê vî gelî yê dibêje "tu hêz nikare îradeya me bişkîne û pêşeroja me tarî bike" li asoyên cîhanê deng vedide.



# Li Rojava lihevkirina huner û şoreşê

**Di şoreşên gelan de huner amûreke girîng a têkoşînê ye. Li Rojava jî huner bi roleke mezin di şoreşê de rabû û bala pêkhateyên civakê hemûyan kişand ser xwe.**

Çendî şoreş bi pêş ket, huner jî bi pêş ket; huner rewşa gelên herêmê vedibêje, şoreşê rave dike, bûyerên wê belge dike, êşên wê tîne ziman û şehîdên wê bi bîr tîne. Huner her wiha bi roleke mezin rabû di parastina coşa şoreşê de. Wêneyek li ser têkoşîn û rizgariyê pêşkêş kir ku armanca herî bilind a ku şoreşa 19`ê Tîrmehê li ser bingehê wê dest pê kiriye.

Di vê dawiyê de gelek hunermend stranên nû çêkirin, û weşandin. Di van stranana de rastiya dijminê xwînxwar eşkere dikin. Yek ji wan berheman stran û kilîpa "Serêkaniyê û Avaşîn" a Hunergeha Welat e, ku ji aliyê xelkê herêmê ve hat ecibandin, nexasim piştî ku bi awayekî berfireh li ser medyaya civakî belav bû.

Hunergeha Welat ji bo şermezarkirina tecrîdkirina rêber Abdullah Ocalan strana 'Serok' ji nû ve saz kir ku ji aliyê Koma Agirî ya Helebê ve sala 1991'an, hatibû derxistin.

Her wiha komeke hunermendên Kurd xebata bi navê "Destana PKK'ê" bire serî. Ev xebata Destana PKK´ê, Tevgera Azadiya Kurdistanê û têkoşîna wê vedibêje. Koma Awazên Çiya, TEV-ÇAND, Komîna Film a Rojava û Saziya Pargînê bi hev re ew çêkir. Her wiha Tevgera Hîlala Zêrîn a Çanda Jinan, kilîpeke nû ya bi navê "Berayê" (Ji bo) derxist. Di kilîpê de piştgiriya serhildana "Jin jiyan azadî" ya Rojhilatê Kurdistanê hat nîşandan.

### Bi hunerê sûcên dewleta Tirk


Hunermend Sîpan Xelat helwêstên destanî yên gelê Bakur û Rojhilatê Sûriyê yên li dijî êrişên dewleta Tirk a dagirker silav kirin û got, "Me nerazîbûneke xurt a birûmet û berxwedaneke bêhempa li hember van êrişan dît."

Sîpan Xelat diyar kir ku ew hewl didin, bi rêya stran, şano, film, govend, helbest û cûreyên din ên hunerî, sûcên dewleta Tirk a dagirker ên li dijî gelê herêmê eşkere bikin û balê bibin ser berxwedana gel û şervanan. Sîpan bang li hunermend û rewşenbîran kir da ku sûcên dewleta Tirk a dagirker ên li dijî gelê Bakur û Rojhilatê Sûriyê eşkere bikin: "Ev êriş ne tenê di vê dema niha de ne, ji berê de li dijî me êriş tên kirin, dixwazin çand û nasnameya me tine bikin. Ji ber wê, divê em bi her rêbazê hewl bidin siyasetên wan têk bibin, erka hunermendan e ku rastiya dagirkeriyê û êrişên wê eşkere bikin."

### Destketiyan diparêzin

Her wiha, endama rêveber a Tevgera Hîlala Zêrîn a Kantona Qamişloyê, Rûken Mihemed destnîşan kir ku







dewleta Tirk a dagirker hewl dide çandên li Rojava qir bike ku Til Helef û deverên dîrokî dagir kirin û got, "Timayên wê bêdawî ne, em jî bi rêya saziyên xwe yên civakî, rewşenbîrî û hunerî hewl didin destketiyên gelê xwe biparêzin û sûcên dewleta Tirk a dagirker eşkere bikin."

### 'Em deyndarê berxwedanê ne'

Li ser mijarê, hunermend û hevseroka Tevgera Mezopotamya ya Çand û Hunerê Demokratîk a Bakur û Rojhilatê Sûriyê, Sumeye Mihemed da zanîn ku ew stranan li ser şoreşa Bakur û Rojhilatê Sûriyê, şoreşa jinan, serhildana gel, bikaranîna çekên kîmyewî ji aliyê dewleta Tirk a dagirker ve li çiyayên Kurdistanê û Serêkaniyê û li ser rêber Ocalan, amade dikin.

Sumeye got, "Em ê berxwedana gel a ji 7 salî heta 70 salî, bidin pêş. Em deyndarên vê berxwedanê ne, çand û huner neynika civakê ne û divê civak rastiya vê bibîne."

***ANHA***

# 'Xelata salê ya ruhê sînemayê' wergirt

**Sînemavan û aktivîsta mafên mirovan Mehnaz Mohammadî li Kelarê "Xelata salê ya ruhê sînemayê" wergirt. Ji ber ew niha di mal de hepskirî ye nikaribû beşdarî festîvalê bibe. Lê wê hinek porê xwe jêkir, şand merasîmê û bang kir da ku xelk pişta raperîna gel bigire.**

Di Festîvala Filman a Navneteweyî ya Kelarê (IFFK) 27'an de 'Xelata salê ya ruhê sînemayê' dan sînemegera Îranî Mehnaz Mohammadî (Muhemedî). Mehnaz Muhemedî piştgirî dabû raperînên li Îranê, beşdarî festîvalê nebû, lê hinek porê xwe yê jêkirî ji festîvalê şand.

Li paytexta eyaleta Kelar a Hindistanê, Thiruvananthapuram ji sala 1996'an ve li beşa karûbarên çandê ya eyaleta Kelarê ji aliyê akademiya Chalachitra ya eyaleta Kelarê ve festîvala filman a Kelarê ya 27'an hate lidarxistin. Îsal "Xelata salê ya ruhê Sînemayê" di 9'ê Kanûnê de dan sînamegera Îranî Mehnaz Muhemedî. Wê piştgirî dabû serhildanên Îranê yên di 16'ê Îlonê de piştî qetilkirina Jîna Amînî hatibûn destpêkirin. Ji ber ku sînemavana Îranî Mehnaz Muhemedî di hepsa malê de bû, nekarî beşdarî merasîmê bibe, lê wê hinek porê xwe jêkir û ji bo piştgiriya serhildanan ji festîfalê re şand.

Mehnaz Muhemedî bi belgefilmên xwe jî tê naskirin. Lê ew herî zêde bi filma xwe ya "Jinên bê sî" (2003) tê naskirin. Di vê filma xwe de behsa wan jinan dike yên ku hatine terikandin û li saziyên dewletê bêxwedî hatine hiştin. Ji xeynî vê filmê, filmeke wê ya bi navê "Seyahatname" jî heye. Filma wê li gelek festîvalan hat nîşandan û xelat wergirtin.

### 'Pêdiviya me bi yekitiyê heye'

Peyama Mehnaz Muhemedî ya ji bo festîvalê, ji aliyê amadekarê Yewnan yê filman û amadekarê projeyan, Athina Rechel Sangari ve hat xwendin; "Ji bo vê êşa dikişînim bidim nîşandan, min porê xwe jê kir. Ev



nîşaneya wê êş û nexweşiyê ye ku ez dikşînim, rabin piştgiriyê bidin raperînê, ji ber ku gelek ciwan tên kuştin û bidarvekirin. Di 8'ê Kanûnê de ciwanê 23 salî Muhsîn Şikarî ji bo ku bêedaletî şermezar kir, hat bidarvekirin. Ez vê peyamê rêdikim, ji ber ku di van rojan de ji bo em mafê xwe yê rewa bi dest bixin, ez dizanim pêdiviya me hemûyan bi yekîtiyê heye. 'Jin jiyan azadî.'

### Lîsa Çalan eynî xelat sala 2021'ê wergirtibû

Xelata ruhê sînemayê ya IFFK li hemberî hemû zextan azweriya xwe ya sînameyê berdewam kir, ji bo were teqdir û spasiyê tê lidarxistin. Di sala 2021'ê de ev xelat cara yekem sînemagera Kurd Lîsa Çalan ku di 7'ê Hezîrana 2015'an de di mitînga partiya Demokratîk a gelan HDP'ê de di êrîşa bombayî de herdu lingên wê jêbûbûn girtibû.

**-JİNHA**

# Li dijî qirkirinê 'Em ê bêjin!'

**Li dijî astengî û qedexeyên li ser çand û zimanê kurdî yên desthilatê, bi dirûşmeya "Em ê bêjin" di 17'ê Kanûnê de li navçeya Kuçukçekmece ya Stenbolê wê konserek were lidarxistin. Hunermend Engîn Cengîz got, armanca polîtîkayên bişaftinê tesfiyekirina hêza birêxistinkirî ya civakê ye.**


Li dijî hişmendiya qedexeker jî têkoşîn bi biryardarî didome. Amadekariyên konsera bi dirûşmeya "Em ê bêjin" ya li Navenda Pêşande ya Yahya Kemal Beyatli ya li Kuçukçekmeceyê ya 17'ê Kanûnê, Şirketa Organîzasyonê ya Seymenê dike. Di konserê de ya ku wê bi gelek zaravayên Kurdî stran têde werin gotin, hunermend Erdogan Emîr, Mehmet Atli, Koma Muzîkê ya ji Rojhilatê Kurdistanê Rastak û koma Şahiya Stranan wê derkevin ser dikê. Di konserê de gelek stranên ku ji Kurdî hatine wergerandinî Tirkî jî wê bi Kurdî werin gotin.

Perwerdekarê Navenda Çanda Mezopotamyayê (NÇM) û hunermend Engîn Cengîz û ji Organîzasyona Seymenê Dîlan Sûyû li ser qedexeyên konser, şano û aktîvîteyên Kurdî yên di demên dawî de zêde bûne û naveroka konserê axivîn.

### 'Em berê xwe bidin hilberînê'

Cengîz got, hişmendiya qedexeker a dewletê ya li dijî çand û huner, ji berê ve dewam dike lê li dijî vê têkoşîneke bi salan jî heye û diyar kir ku qedexeyên berfireh ên li ser çand û huner, bi eleqeya civakê ya di vî warî de, xuya bûye. Cengîz, bi bîr xist ku ji bilî saziyên Kurdan, li dijî gelek kes û komên muzîkê çêdikin, astengî heye û got, "Hikûmet dema vê dike, bi navên ji nirxên civakê dûr, û populîst ên ku li ber wan serî ditewînin, dike. Bi vî awayî li Sûr û Cizîrê mihrîcan li dar xistin. Hikûmet, hunermendên li ber wan serî natewînin jî weke 'terorîst' bi nav dike. Dixwazin hêza birêxistinkirî tesfiye bikin. Di demekê de ya ku her tişt xwe dubare dike, divê mirov berê xwe bide hilberînê."

### Stranên Kurdî kirine malê xwe




Ji Organîzasyona Seymenê, Dîlan Sûyû jî got, "Her aktîvîteya ku em bikin, 3-4 saetan beriya dest pê bike, tê qedexekirin. Lê tevî her tiştî jî em ê dest ji berxwedanê bernedin." Sûyû, got, hewl didin çand û zimanê Kurdî bidin jibîrkirin, û ew jkî li hemberî hewl didin bi konseran vî zimanî li ser piyan bidin sekinandin: "Armanca kombûna Şahiya Stranan bi nerazîbûna ji wergera stranên Kurdî ya bo Tirkî çêbû. Di çarçoveya vê projeyê de stranên me hemû yên ku Tirkan ew dizîne û kirine malê xwe, dê bi Kurdî werin gotin. Di dawiya vê xebatê de 3 albûm derketine holê."

***MA***

# Li Şehbayê pirojeyên pêşxistina aboriya jin dewam dikin

Berdevka Komîteya Aborî a Kongra Star ya herêma Efrînê Xezal Hesen diyar kir ku pêkanîna projeyên wan yên aboriya jinan di dimon û got, xurtbûna jin ya di aliyê aborî de, ji her alîve ji bo xurtbûna civakekê pir girînge. Lewma armanca me ewe ku em vê rastiyê jiyanî bikin.

**Zana Roj/ Şehba**

Welatiyên li herêma Şehbayê ji ber êrîşên dewleta Tirk ya dagirker û dorpêça hikumeta Şamê ya li ser herêmê, di milê aborî de pir zehmetiyan jiyan dikin. Lê tevî êrîş û zehmetiyan jî, gelê herêmê bi kêmderfet debara jiyana xwe dikin. Herwiha ji aliyê rêveberî û saziyên herêmê ji pêşxistina aboriya welatiyan xebatên cur bi cur dimeşînin. Yek ji rêxistinên ku pirojeyên pêşxistina aboriya civakê bênavber dimeşîne, Kongra Star e. Herî dawî li herêma Şehbayê ji bo destekdayîna aboriya jin û alîkariya bi jinan re di milê aborî de, Kongre Star'ê hin pirojeyên çandiniyê dan destpêkirin. Ev proje xebatekî koparatîfe.



Têkildarî van pirojeyan berdevka Komîteya Aborî a Kongira Star ya herêma Efrînê Xezal Hesen ji rojnameya me re axivî.

**'Em hewildana peydakirina derfetên kar dikin'**

Xezal Hesen anî ziman ku ji bo derbaskirina aloziyên aborî di rewşa koçberiyê de, wan berê xwe da çandiniyê û wiha destpêkir: "Tê zanîn ku rewşa koçberiyê di her aliyî de bandora xwe li ser jiyana welatiyan dike. Li herêma Şehbayê me xwest em ji erdên vala yên neçandî sûd bigrin û bikaribin ji bo gel derfetên karkirinê peyda bikin. Me dest bi projeyên çandiniyê kir û me hewil da ku bi vî awayî hin pirsgirêkên aborî yên di nava gel de çareser bikin."

**'Malbatên koçber werin gel hev û bibin alîkar'**

Xezal diyar kir ku bingeha sîstema koparatîfê jiyana Komînal e û da zanîn ku civak bi hev re li ser projeyekê kar dike û sûda wî karî jî dîsa ji wê civakê re ye û axiftina xwe wiha domand: "Ev piroje wê li ser çar beşan were dewam kirin. Niha me dest bi çandiniya sîran kiriye, piştire wê pîvaz, kartol û sebze jî werin çandin. Di vê pirojê de endamên 5 malbatan bi hevre kar dikin, mabesta me avakirina rihê hevkariyê di nava civakê de û pêşxistina aboriya civakê ye."

**'Pêşxistina aboriya jinê di civakekê de pir girînge'**



Xezal da xuyakirin ku armanca wan ji van pirojeyan pêşxistina aboriya jin e û wiha got: "Armanca me a yekemîn ew e ku em aboriya jin xurt bikin ku jin bikaribe ji her alî ve pêşengiya civakê bike û ew bi xwe bibe çareseriya zehmetiyên ku jiyan dike; di aliyê aborî de hewcedarê mêr nebin û bikaribin pêwîstiyên xwe û yên zarokên xwe bi dest bixin. Ya girîng ew e ku jin hêz û enerjiya xwe derbixîne nava jiyanê û rola wê di her alî de ya sereke be. Eger di civakekê de jin di hemû aliyan de pêşeng be divê di aliyê aborîde jî bibe roniya civakê. Wê demê aboriya wê civakê tû caran nakeve bin siya tû desthilatan."

# Bilindbûna bihayê xwerekan û sedemên wê

**Rojbîn Zagros/Qamişlo**

Ji ber bihabûna kelûpel û xwerekan şêniyên bajarê Qamişlo zorî û zehmetiyên xwe anîn ser ziman û aliyên têkildar jî sedemên vê bihayê û çaresî eşkere kirin.

Bêdawiya êrişên dagirkirinê yên dewleta tirk, israra neçareseriya rejima Şamê û dorpêça ji her alî ve ya li ser gelê bakur û rojhilatê Sûrî, hişt ku qirîza aborî ya cîhanî li herêmê jî zêdetir bibe. Teybet di dema dawî de, ji ber bilidbûna dolar kelûpel û xwerekên malê pir biha bûye. Herwiha îsal li gorî salên borî zêdetirî çar qatî hatiye ser bihayan û bihayê her tiştî zêde bûye. Welatiyên herêmê jî astengî û zehmetiyan jiyan dikin û ji ber bihayê bêserûber êdî nikarin pêdiviyên xwe peyda bikin. Herwiha Meclisa Pêkanînê ya bakur û rojholatê Sûrî sîstemeke nû ji bihayê xwerekan re danî, di vê sîstemê de her firoşkar wê li gor bihayê giştî bihayê xwe diyar bike. Lewma xwediyên dikanan jî bihayên xwerekan li gorî nirxê dolar diyar dikin.

Derbarê bilindbûna bihayê xwerekan û pêkanîna sîstema nû, welatiyên bajarê Qamişlo, xwediyên dikanên xwerekan û rêveberê beşa pêşjiyanî ya bajarê Qamişlo ji me re axivîn.

**`Bihayê xwrekan pir xeyalî bûne`**

Xalid Hisên bîr xist ku gelek malbat hene xizanin û rewşa wan ya aborî zehmete û wiha dirêjî da axaftina xwe: "Ji ber vê bihabûna bêserûber gelek malbat nikarin pêdiviyên mala xwe peyda bikin. Hem bihabûn heye, hem jî di nava sukê de cûdahiya nir-



xan heye. Em êdî nikarin pêwîstiyên mala xwe peyda bikin. Ez rojane kar dikim û hin caran bi şevê jî karên cûda dikim. Lê disa jî têra pêdiviyan nake ji ber ku, bihayê xwrekan pir xeyalî bûne."

Xalid di dawiyê de got, sîstema nû ya hilbijartina bihayan ji aliyê dikandaran ve ne zêde başe, lewra her firoşkarek li gorî xwe xwerekan bi bihayekî cûda difroşe welatiyan. Herwiha bang li saziyên pêwendîdar û rêveberiya pêşjiyanê kir ku vê pirsgirêkê çareser bikin. Da ku welatî karibin pêdiviyên xwe bi nirxên baş û weke hev pêyda bikin.

**`Îsal tevgera welatiyan li firoşgehê lawaz e`**

Xwediyê dikana xwerekan yê bi navê Ehmed Eniz li ser tevgera welatiyan ya li firoşgehê û firotina xwerekan wiha axivî: "Îsal tevgera welatiyan li firoşgehê lawaz e. Her sal karê me ji niha baştir bû, em ji sibehan heta êvaran vala nedibûn û pir diwestiyan. Lê îsal ji ber ku pêdivî pir biha bûne, karê me jî kêm bû ye. Lewra hin pêdivî hene çar qatî biha bûne. Ev bihabûn jî ne di destê me de ye, ew jî ji ber bilindbûna dolar e."

Ehmed bîr xist ku her sal di vê demê de, wan rojane zêdetirî 200 kîlo zeytûn difirot, lê îsal 50 kîloyan derbas nake. Herwiha got, me bi kartonan zeyta zeytûnan difrot, lê îsal ji ber ku pir biha bûye baş nayê firotin."

**'Ne welatî tenê, em jî zehmetiyan dikişînin'**

Ehmed di berdewamiya axaftina xwe de wiha got: "Ne welatî tenê, em jî zehmetiyan di vî milî de dikişînin. Dema tiştek biha dibe em jî êdî nikarin weke berê kar bikin û astengiyan di karê xwe de dibînin. Her sal min xwerek bi tona digirt û tev dihat firotin. Lê îsal min nikarîbû zêde bigrim, lewra tevger li firoşgehê kême û kar jî êdî lawaz bûye."

Ehmed Eniz wiha dawî li axaftina xwe anî: "Rêveberiya Xweser gelek kargeh ava kirine, em bihêvîne kargehên pêdivî û xwerekan li herêmê zêdetir bibin, da ku em xwerekan ji derveyî herêmê negrin û rastî vê bihabûnê neyên."

**Sîstema nû ya bihayê xwerekan**

Rêveberê Ofîsa Erşîfê ya beşa Pêşjiyanî ya Qamişlo Mehmûd Ebdilqadir Yûsif jî li ser bihayê xwerekan û sîstema nû ya bihayan wiha got: "Wek beşê pêşjiyanî berî niha me lîsteyek ji bihayan re hidibijart û li gorî wê lîstê xwerek û pêdiviyên



jiyanê dihatin firotin. Lê ev demek sîstemeke nû ji bihayê xwerek û pêdiviyan re hatiye danîn. Ev sîstem jî ji heyva Cotmehê ve hatiye pêkanîn û heta niha jî xwediyê dikanan li ser vê sîstemê dixebitin. Herwiha li gorî





sîstema nû her firoşkar dikare li gorî xwe bihayan hildibjêre, lê bi bihayekî baş û li gorî rewşa heyî."

**Hewldanên vekirina ofîseke nû ji bo kontrolkirina rewşa bihayan**

Mehmûd bal kişand ser vekirina ofîsekê bi navê Lêkolîn û Ewlekariya Xwarekan li bakur û rojhilatê Sûriyê ku welatî bi rêya vê ofîsê giliyên xwe bigihînin berpirsyaran û wiha pê da çû: Dema gazinên welatiyan ji dikaneke ku bihayên wê bêserûberin hebe, dê Ofîs bi rêya komîteyên pêşjiyanî li ser vê yekê bisekine û çareser bike. Mehmûd Ebdilqadir Yûsif di dawiyê de bang li welatiyan kir ku gilî û gazinên xwe li ser firoşkarên ku madeyan bi buhayeke bilind difroşin bikin û agahiyan bidin wan. Herwiha got, wek rêveberiya Pêşjiyanî em rojane rewşê dişopînin. Lê pêwîste welatî jî bi me re alîkarbin û dema tevlîheviyek di bihayan de hebe yekser agahiyê bidin me, da em li ser biskinin û rê li pêşiya kesên wisa bigrin.



# Rejima Îran'ê her roj ciwanekî bidarve dike

Rejîma Îranê piştî darvekirina Mohsen Şekarî, serê sibeha 12 mehê ciwanê bi navê Mecîd Riza Rehneverd jî darve kir.






**Navenda Nûçeyan**

Çalakiyên ku li Tehranê piştî kuştina Jîna Emînî di 16'ê îlonê de dest pê kirin, nêzî 3 meh in dewam dikin. Li hember çalikvanan rejîma Îranê bi guleberdana rast e rast nêzî 500 kesan kuştin, bi hezaran kes birîndar kirin û 18 hezar kes binçavkirin ji berk u nikare pêşî li çalekiyên gel bigire, dest bi darvekirina çalekvanên girtîkirin. Êdî her roj ciwanekî bi darvedike û dixwaze bi "sûcê şer" çavegelbitirsîn e.

Piştî darvekirina Mohsen Şekarî yê 23 salî ya di 8'ê mijdarê de, ciwanekî din jî hate darvekirin. Li Meşhedê, ku navenda rêveberiya Eyaleta Xorasana Razevî ye, ciwanê bi navê Mecîd Riza Rehneverd li meydaneke ku komeke mirovan lê hate komkirin, hat darvekirin.

Di 17'ê mijdarê de li Kolana Heremelî ya Meşhedê du endamên Besicê (polîs) hatibûn kuştin. Îdianameya derbarê Mecîd Riza Rehneverd ê ku di 24'ê mijdarê de bi hinceta tevlî vê çalakiya ku polîs tê de hatibûn kuştin bûbû, hatibû binçavkirin. Ev di 29'ê mijdarê de hat qebûlkirin. Mecîd Riza Rehneverd li pêşberî kamerayan hate darizandin. Piştî şahidiniya polîs û çend kesan a li ser roja bûyer qewimîn, di encama darizandineke bilez de Mecîd Riza Rehneverd ê ji kuştina 2 kesan û birîndarkirina 4 kesan berpirsyar dihate dîtin, bi îdiaya "sûcê şer" kiriye cezayê darvekirinê lê hate birîn.

Dadgehê her wiha biryar da ku Mecîd Riza Rehnever li ber çavên mirovan li qadekê were darvekirin.

Piştî ku Dadgeha Bilind jî biryar pejirand, Mecîd Riza Rehneverd serê vê sibêha 12 Kanûnê li qadeke ku komeke mirovên Meşhedî lê hatin komkirin, hate darvekirin.

Peywîrdarên di saetên serê sibê de li malbatê geriyan, ragihandin ku Mecîd Riza Rehneverd piştî hate darvekirin hatiye veşartin.

Serdadgerê Xorasana Ravezî Xulamelî Sadeqî piştî înfazkirina cezayî, ji bo îstîxbarat, polîs û endamên darazê bilez tevgeriyan spasiyên xwe pêşkeşî wan kirin.

# HPG: 4 dagirker hatin cezakirin

**Navenda Nûçeyan**

***HPG'ê ragehand ku di encama calakiyên hêzên wan de 4 leşkerên Tirk ên dagirker hate cezakirin û yek jî birîndar bû û got, dagirkeran 12 caran bi çekên kîmyewî û 2 caran jî bi bombeyên qedexe êrîşî qadên gerîla kir.***



Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya HPG'ê bi daxuyaniyekê ragehand ku di encama çalakiyên hêzên wan de 4 leşkerên dewleta Tirk ya dagirker hatin cezakirin û dagirkerek birîndar bû. Herwiha da zanîn ku artêşa Tirk a dagirker 12 caran bi çekên kîmyewî û 2 caran jî bi bombeyên qedexe çeperên berxwedanê yên gerîlayan bombe kir. Herwiha dagirkeriyê 5 caran bi balafirên şer û bi dehan caran jî bi obus, tank û çekên giran qad bombe kir.

HPG'ê di daxuyaniya xwe de diyar kir ku di çarçoveya Pêngava Şoreşger ya Bazên Zagrosê de li herêma Zap, roja 12'ê Kanûnê saet 10:30 û 18:20'an de li derdora çeperên şer ên gerîlayan a li qada Çemçoyê ya Şêladizê tîmên wan yên gerok bi çekên giran du caran li dagirkeran dan. Di van çalakiyan de herî kêm 3 dagirker hatine cezakirin û dagirkerek jî birîndar bûye.

HPG'ê da xuyakirin ku di 12'ê Kanûnê saet 22.30'an de li derdora çeperên berxwedanê yên gerîla yên li herêma Sîda ya Şêladizê hêzên wan bi çekên giran li dagirkeran dan. Herwiha da zanîn ku di 12'ê Kanûnê saet 22:30 û 15:00'an de li derdora çeperên berxwedanê yên gerîla yên li herêma Sîda ya Şêladizê tîmên wan yên gerok bi sûîkastê li dagirkeran dan û di vê çalakiyê de dagirkerek hate cezakirin.

Derbarê êrîşên artêşa Tirk a dagirker ên bi bombeyên qedexe û çekên kîmyewî jî, HPG'ê da zanîn ku di 12'ê Kanûnê de çeperên berxwedanê yên gerîla yên li nêzî gundê Sîda û herêma Çemço ya Şêladize ya navçeya Amediyeyê 2 caran bi bombeyên qedexekirî hatin bombekirin. HPG'ê diyar kir ku di 12'ê Kanûnê de çeperên berxwedanê yên gerîlayan ên li nêzî herêma Çemço ya navçeya Şêladize ya Amediyeyê 12 caran bi çekên kîmyewî hatin bombekirin. HPG'ê ragehand ku di 12'ê Kanûnê de Qadên Girê Ortê, Girê Çarçel ên Metîna û derdora Gundê Şelaze 5 caran bi balafirên şer hatin bombekirin, herwiha 12'ê Kanûnê Qadên Berxwedanê yên Girê Cûdî, Girê Bihar û Çemço bi dehan caran bi obus, tank û çekên giran hatin bombekirin.


# Çalakî û operasyonên li dijî dagirkeriya Tirk û çeteyên DAIŞ'ê berdewamin

**Navenda Nûçeyan**

**Hêzên Rizgariya Efrînê bi daxuyaniyekê ragihand ku di encama çalakiyên hêzên wan de 2 çeteyên dagirker hatine kuştin. Li aliyekî din jî QSD'ê ragehand ku di encama Operasyonên Yekîneyên Antî Terorê de, Serçeteyê DAIŞ`ê û du çete hatin girtin**

Hêzên Rizgariya Efrînê (HRE) bi daxuyaniyekê diyar kirin ku li hemberî êrîşên hovane yên dagirkeriya Tirkî yên ser herêmê, hêzên wan li gelek herêman çalakiyên bersivdanê yên bi bandor lidar xistine.

HRE'ê da daxuyaniya xwe de diyar kir ku hêzên wan di 4'ê Kanûnê de li herêma Ezazê li dijî baregeha




'Polîsên Taybet' ên dewleta Tirk çalakiyek lidarxistin û di encama vê çalakiyê de wesayiteke dagirkeran hatiye îmhakirin û 2 polîs jî birîndar bûne.

HRE'yê da xuyakirin ku di 6'ê Kanûnê de jî, hêzên wan li herêma Babê bi rêbaza sekvaniyê çalakiyek lidarxistin û di encamê de çeteyekî dewleta Tirk hatiye kuştin.

HRE'ê da zanîn ku di 7'ê Kanûnê de, hêzên wan li herêma Marê di çalakiya sekvaniyê de çeteyekî dagirker kuştiye.

Hêzên Rizgariya Efrînê (HRE) da xuyakirin ku çalakiyên hêzên wan ên bersivdana li hemberî êrîşên dewleta Tirk a dagirker wê dewam bikin.

Serçeteyê DAIŞ`ê û du çete hatin girtin

Li aliyekî din Hêzên Sûriya Demokratîk (QSD`ê) li ser malpera xwe ya fermî daxuyaniyek nivîskî weşand û tê de ragehand ku di encama operasyona hêzên wan de, li Hol, Til Hemîs û Dêrazorê serçeteyekî DAIŞ`ê û 2 çeteyên berpirsên dabînkirina çek û cebilxaneyan ji şaneyên terorîst ên hewl didan êrişî kampa Holê û girtîgehan bikin, girtin.

QSD'ê di daxuyaniya xwe de got,




bi êrişên dewleta Tirk a dagirker û çeteyên wê yên dijî herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê re, şaneyên DAIŞ`ê ketin tevgerê û hewl da êrişên êrişên terorê dijî deverên cuda wekî Dêrazor, Hol û Til Hemîsê pêk bînin.

Hate ragehandin ku Yekîneyên Antî Terorê (YAT) bi hevkariya Hêzên Koalîsyona Navneteweyî li dijî cihên li herêmên cuda yên Bakur û Rojhilatê Sûriyê ku şaneyên DAIŞ`ê xwe lê vedişartin, 3 operasyon pêk anîn, di encama van operasyonan de jî serçeteyekî DAIŞ`ê, 2 çeteyên berpirsên peydakirina çek û cebilxaneyan ji şaneyên terorîst yên ku hewl didan êrişî kampa Hol û girtîgehan bikin, hatine girtin, gelek çek û cebilxaneyên bi wan re jî hatine desteserkirin.

QSD`ê d daxuyaniya xwe de ragehand ku di encama operasyon ji 7 heta 10`ê Kanûnê li bajarokê Holê, Til Hemîs û Dêrazorê hatine lidarxistin gelek çek hatine desteserkirin. Çekên ku hatine desteserkirin jî wiha ne:( Kilaşînkov: hejmar 1, dabança: hejmar 1, bombe; hejmar 2, dûrbîn; hejmar 1, rext; hejmar 4, gelek carcûr û cebilaxane, mîqdareke madeyên taqemeniyê û hejmareke telefonên destan).

# Rewşa Cîhanê Ya Roja Me Ya Îro Rewşa Emperyalîzmê Ye

**Ji bo fêmkirina vê tevgera antî-şoreşgerî ku bi pêşengiya DYE'ê tê kirin, divê rewşa ku emperyalîzmê di nav de bû hê ji nêz ve were dîtin.**

**RÊBER APO**

Sîstema emperyalîst, ji bo ku nakokiyên xwe çareser bike û hilweşîna xwe dereng bixe, serî li şer dabû. Lê di encamê şer de, birînên hê mezintir derketin. Li dijî emperyalîzma ku di dema şer de û piştî şer dema xwe ya herî zeîf dijiya, gelên cîhanê, ketin nav têkoşîneke mezin a berxwedan û şoreşê. Dema ku avakirina sosyalîzmê pêş diket, tevgerên rizgariya neteweyî û çîna karker jî serkeftinên mezin bi dest xistin. Ji ber van sedeman, dewletên emperyalîst dema fêm kirin ku bi tinebûneke bêsînor re rû bi rû ne, nakokiyên di navbera xwe de xistin planê duyemîn. Ji bo ku şoreşa cîhanê asteng bikin, bi pêşengiya DYE ya ku ji şer herî zêde bi feyde derketibû, ji bo demekê bi hev re îtifaq pêş xistin.


Ji bo fêmkirina vê tevgera antî-şoreşgerî ku bi pêşengiya DYE'ê, divê rewşa ku emperyalîzmê di nav de bû hê ji nêz ve were dîtin.

Emperyalîzma Almanya, Îtalya û Japonya faşîst ku bibû sedema bingeha şer, bi binkeftineke mezin re rû bi rû ma. Ekonomiya wan a ku hê bêhtir bi armanca şer hatibû birêxistinkirin, bi temamî hilweşiya. Beşeke mezin û aktîf a hêza mirov, hin miribû hin jî seqet mabû. Kargeh bi temamî xirab bibûn. Îngilîz û Fransa jî, ji şer serkeftî derketibûn û rewşa welatên din yên Ewrûpayê jî, ji vê ne cuda bû. Eger ji nûve rêxistinbûnek avanekiriban e, ne gengaz bû ku kapîtalîzmê jiyana xwe berdewam bikira.

Emperyalîzma DYE'ê ku di kêliya dawî de tevlî şer bibû, ji ber cihê xwe yê coxrafîk zêde zerer nedît. Herwiha talana ku di şer de kiribû, hişt ku bibe dewleteke pir bi hêz. Dema DYE'ê kontrola emperyalîzmê dixist destê xwe, diviyabû li aliyekî ekonomiyên ku bibûn xirabe, ji nûve ava bike û li aliyê din jî weke berdêla vê, li mîrateya kapîtalîzmê ya li mêtingehan xwedî derkeve. Dema ku rewşa bêhêz û bêquwet a Îngilîzîstan û Franseyê bi berxwedana mêtingehan re bû yek, şiklê nû yê mêtingeriya DYE'ê bû neçariyek. Li beranberê tevgerên sosyalîst û rizgariya neteweyî, diviyabû bêyî ku bi derengî bikeve ev erk hatiba pêkanîn.

Li gorî doktrînên Marshall û Truman, di navbera pêşketin û mezinbûna welatên kapîtalîst û hêzên ekonomîk û leşkerî yên van welatan de îtifaqek weke neçarî hat dîtin. Rêxistinên weke NATO, CENTO, RCD, SEATO ku li gorî vê hatibûn avakirin, xwe dispêrin bingeha krîzên siyasî û leşkerî yên di nav sîstemên kapîtalîst de bi hev re pêşwazî kirin, li dijî welatên sosyalîst û tevgerên rizgariya neteweyî, helwesteke şîrîk girtin. CEA'ê (AET) ku rêxistina ekonomîk a emperyalîstên Ewrûpayê ye, tevî ku di qada ekonomîk de li dijî Emerîkayê derdiket jî, di bingeha xwe de li dijî tevgerên sosyalîst û rizgariya neteweyî li gel emperyalîstên din tevdigeriya. DYE'ê, li gorî doxtrîna Monroe, xwe weke hakimê xwezayî yê parzemîna Emerîkayê dihesiband û bi pêşengiya xwe paktên (yekitiyên) cur bi cur ên aborî û leşkerî ava kirin.

Dema kuhê di navbera du şerên cîhanê de weke înkara demokrasiya burjuwa şiklên dewletê (faşîst, olîgarşîk) yên ji aliyê grupên tekdest (tekel) ve dihatin ferzkirin derketine holê, hem li metropolan û hem jî li navçeyên pêve girêdayî de, hikumetên bi hevkariya faşîst, sosyal û demokratan çêbûn û cuntayên leşkerî li pey hev hatine ser desthilatê.
Di qadên çandê yên weke felsefe, wêje û sînema de heya asta dawî, meyîlên ji rê derketî hatine pêşxistin.
Bi navgîniya amûrên
biquwet, mirov ji pirsgirêkên xwe yên herî jiyanî hatin qutkirin û neçarî kesayetiyên bêhelwest hatin kirin. Hewl hat dan ku nirxên mirovahiyê yên di seranserê dîrokê de hatîn bilind kirin, werin xistin û bikevin bin lingan. Pêşketinên di zanist û têknolojiyê de bi qasî ku xizmeta berjewendiya tekdestan dike, hatin pratîzekirin. Enerjiya atomê ku serkeftina zanist û teknolojiyê ye, hat xistin û bû amûrekî ku timî gef li mirovahiyê dixwe.
Burjuwayên welatên emperyalîst, dema kozmopolîtîzm li aliyekî weke şiklekî jiyanê digirtin dest, li aliyê din ji bo ku di navbera kedkaran de nakokî biafrînin, ji pêşxistina şovenîzmê paşde neman. Arîstokrasiya karkeran ku di encama kirîna beşeke karkeran de pêk hatibû, bû bîngeha madî ya şovenîzm, revîzyonîzm û reformîzmê. Hewl hat dayin ku çîna karker bixin bin tesîra van meylên ku xizmeta emperyalîzmê dikirin. Di vê armancêde jî di asteke pêş de bi serkeftin.
Sîstema kapîtalîst-emperyalîst, tevî vê tevgera ji nû ve bi rêxistinbûn û avabûnê ku bi pêşengiya DYE'ê hatibû destpêkirin, di nav xwe de diderizî û li beranberê welatên sosyalîst, çîna proletarya û tevgerên rizgariya neteweyî, nedikarî serkeftinê
bidest xwe ve bîne.
Ma ev rewş, ku emperyalîzma DYE'ê ji bo rizgarkirina kapîtalîzma li ber



sikratê ye û her roj parçeyekî xwe wenda dike ketibû nav,
naşibe rewşa împaratoriya Romayê ku dixwest koletiyê rizgar bike an jî naşibe împaratoriyên Çartiya Rûs û OsmaniyênTirk ku dixwestin feodalîzmê rizgar bikin? Ma ew jî di dema xwe de pir bihêz û biheybet xuya nedibûn?

Rêber Apo
Jî Perspektîfên Rêber Apo "Riya Şoreşa Kurdistan'ê"

# Hêviya xwe bir sêdarê!

**Rejîma Îranê li hember serhildanên li Rojhilatê Kurdistanê û li Îranê berê xwe dide bidarvekirina bêhtir mirovan. Ji bo çavên gel bişikîne, xelkê çavtirsandî bike, bi tirsê pêla serhildanê sar bike, êşkence û bidarvekirinan zêde dike.**

Rejîma Îranê ji bo çavên gel bişikîne. xelkê çavtirsandî bike û bi tirsê pêla serhildanê sar bike, ciwanekî din bi dar ve kir. Dezgeha edlî ya Îranê ragihand ku rejîmê doh, yanî duşemê kesekî din, bi tohmetên cihgirtina di raperînê de hate bidarvekirin.
Malpera dezgeha edlçî ya Îranê Mizanê diyar kir ku ciwanê bi navê Mecîdreza Rehneverd ji ber ku du karmendên ewlekariyê bi kêrê kuştine û çar kes jî birîndar kirine, hatiye bidarvekirin. Mecîdreza Rehneverd di 17'ê Cotmehê de hatibû girtin.

Herî dawî hefteya bihurî, roja pêncşemê Mohsen Şekarî yê 23 salî bi hinceta ku endamekî Besîc birîndar kiriye, hatibû bidarvekirin. Li gorî çavkaniyên herêmî, piştî derbasbûna 4 rojan di ser bidarvekirina yekem a xwepêşanderên Îranê, doh xwepêşanderê duyem ê bi navê Mecîdreza Rehneverd bi fermana deshilata dadwer û bi biryara Dadgeha Şoreşê ya bajarê Meşhedê ji bo xof û tirsê di gel de çêbikin li pêş çavê xelkê hat bidarvekirin.
Her wiha metirsiya bidarvekirinê li ser xwepêşanderê bi navê Mahan Sedrat jî heye. Li gorî agahiyan, dosyeya wî şandine beşa pêkanîna bidarvekirinê. Yek ji kesên hatine girtin, hunermendê Kirmaşanî Saman Yasîn (Seyid) e ku cezayê bidarvekirinên lê hatiye birrîn. Li gorî parêzerê Saman Yasîn, li ser dosyeyê biryara nepeniyê hatiye dayîn, lewre nikariye dosyeyê bibîne.


### Bi êşkenceyê qetil kirin

Li aliyê din rejîma Îranê bi êşkenceyê şehîdkirina xelkê jî dewam dike. Ciwanê Kurd ê bi navê Şehriyar Adelî di nezareta rejîma Îranê de bi êşkenceyê hat şehîdkirin. Hêzên rejîma Îranê cenazeyê Şehriyar Adelî bêyî ku tiştekî ji malbata wî ya li bajarê Serdestê re bibêjin, dan malbatê. Wan ji malbatê re tenê got, kurê wan di nezaretê de miriye. Lê li ser bedana kurê ciwan Şehriyar Adelî şopa êşkenceyê hebû. Ev yek jî ji wêneyên ku hatîn belavkirin xuya dike. Li gorî agahiyan, li navenda nezaretê istîxbarata Îranê ya li Serdeştê êşkence li Şehriyar Adelê hatiye kirin.

### Nikarin vîna gel bişikînin

Tevî pirsgirêkên ewlehiyê, girtin û serdegirtina malan, sepandina cezayên giran ên weke cezayên bidarvekirinê li ser xwepêşanderên girtî jî, xwepêşandan û çalakiyên Serhildana 'Jin jiyan azadî' ya gelên Rojhilatê Kurdistanê û Îranê bi şêweyên cuda bênavber dewam dikin.
Pêr li navçeya Teawnî ya bajarê Kirmaşanê, komek ciwan kom bûn û li dijî sepandina cezayê bidarvekirinê û pêkanîna vî cezayî li ser xwepêşanderên hatine girtin, çalakî li dar xistin.
Li bajarê Sine, karkerên kargehên petrokîmyayê dest bi grevê kir û xwepêşandan li dar xistin.
Li ser asta Îranê jî xwepêşandan û çalakiyên li dijî dewletê û bi taybet li dijî sepandina cezayê bidarvekirinê li ser xwepêşanderan, dewam kir. Her





wiha li Kerecê xelkê çalakî li dar xistin û nerazîbûnên xwe bi dirûşmeyan anîn ziman.
Di heman demê de li hinek zanîngehên Tehran, Îsfehan û Babolê xwepêşandanên xwendekaran dewam kirin. Di xwepêşandanan de daxwaza berdana xwendekaran û xwepêşanderên girtî hate kirin.

### Nerazîbûna cîhanê

Piştî bidarvekirina xwepêşander Mohsen Şekarî, li Rojhilatê Kurdistan û Îranê û seranserê cîhanê nerazîbûnên tund li beramberî dewleta Îranê derketin pêş.
Ji derveyî Îranê, li gelek welatên Ewrûpayê, li Kanada, Awustralya û Zelandaya Nû, xwepêşandan û çalakî ji bo piştgiriya xwepêşandarên Îranê û li dijî sepandina cezayê bidarvekirinê li ser xwepêşanderên girtî, hatin li darxistin.
Di rojên bihurî de di encama biserdegirtinên malan de, hêzên rejîmê bi dehan kes kirin nezaretê.
***Yenî Ozgur Polîtîka***



# Dîmenê termê leşkerê bi navê Mûstafa Bazna hat weşandin

**Gerîla TV dîmenê termê leşkerê dagirker yê bi navê Mûstafa Bazna weşand û bîr xist ku ev leşker li Qada Berxwedanê ya Girê Fm a Metînayê de hatibû cezakirin.**

Hejayê bîrhistinê ye ku HPG'ê di 7'ê miha Kanûnê de bi daxuyaniyekê ragihan ku di çalakiya 3'ê Mijdarê de ya li Metînayê termê leşkerê bi navê Mûstafa Bazna di destê wan de ye. Herwiha da zanîn ku dewleta Tirk hejmara leşkerên xwe yên mirî vedişêre û HPG'ê di daxuyaniyê de wiga gotibû: "Me di daxuyaniya xwe ya 4'ê Mijdarê de diyar kiribû ku di 3'ê Mijdarê de saet di 12.20'an de di çalakiya li Qada Berxwedanê ya Girê FM a Metînayê ku nêzî navçeya Amêdiyê ya Başûrê Kurdistanê ye, me cenazeyê leşkerekî, alavên wî yên leşkerî û telefona wî ya destan desteser kiribû. Agahiyên termê leşkerê di destê me de wisa ne. Navê wî Mûstafa Bazna ye, navê dê û bavê wî Dondu û Ramazan e, di 14'ê Gulana 1996'an de li Duzceyê ji dayik bûye û nimreya nasnameya wî 13082287382 ye. Lêbelê hatiye zanîn ku mirina vî leşkerî ji raya giştî û ji gelên Tirkiyeyê hatiye veşartin. Her çiqas li hemberî me rastiya dijmin a ku mirovayetiya xwe ji dest daye heye em Hêzên Parastinê yên Gel ên Kurdistanê li gorî exlaqê mirovayetiyê, nirxên hevpar ên gelan û qanûnên şer tevdigerin û heke were xwestin em dikarin bi rêya sivîl an jî saziyên civakî yên sivîl termê leşkerê bi navê Mûstafa Bazna teslîmî malbata wî bikin."
Piştî vê daxuyaniyê, dîsa HPG'ê bi rêya Gerîla TV dîmenê termê leşkerê Tirkiyê yê bi navê Mûstafa Bazna weşand û bi vî dîmenî dîsa teqez kir ku termê leşker hê di destê wan de ye. Herwiha gerîlayên HPG û YJAStar'ê yên di



dîmen de axiftîn diyar kirin ku ew di tekoşîna xwe de mafdarin û gotin: "Em ji bo mafê xwe yê azadiyê şer dikin û em li ser xaka xwe vê tekoşînê dimeşînin. Yê ne mafdar û êrişê hebûname dike dewleta tirk ya faşîst e. Emê heya dawî jî vê tekoşîna xwe ya azadiyê bimeşînin. lewma bangawazîya me ji bo malbat, dê û bavên van leşkeran ewe ku ji bo emelên faşîzma dewletê zarokên xwe neşînin mirinê. Her kî bê ser xaka me û êrişê me bike dawiya vî wê wek vîleşkerî be."

# Hevokek û gelek peyam!

**Dibistan û ambara genim a gundê Um El Kêf ku di êrişa dewleta Tirk a dagirker de hilweşiyane, gundî tengezar kirin, zarok bê perwerde hiştin. Li pey êrişan nivîsa li ser texteyê dibistana hilweşiyayî maye: "Serkeftina rasteqîn serkeftina li hember nezanînê ye."**

Li navçeya Til Temir a girêdayî kantona Hesekê cihên xizmetgûzarî û perwerdeyê yên ku hatine topbaran û bombebarankirin, rastiya êrişên dewleta Tirk a dagirker radixe ber çavan.



Yek ji van deveran gundê Um El Kêf ê dikeve rojavayê navçeyê ye. Dîmenên dibistana gund û ambarên genim ên bûne hedefa êrişan bersiva pirsa "hedefa dewleta Tirk çi ye?" didin.

Dibistana gund ku bi dehan zarokan tê de perwerde didît wêran bûye û êdî nayê bikaranîn.
Dîwar hilweşiyane, rûniştek û alavên din ên dibistanê şikestine, polên perwerdeyê serobino bûne, pencere û derî li erdê ne.
Ji hilweşandinê tenê hevokek li ser texteyê perwerdeyê ku bala mirov dikişîne û difikirîne maye. Di nava resmên gulan de nivîsa "Serkeftina rasteqîn serkeftina li hember nezanînê ye" hatiye nivîsandin.
Amberên genim ên li gund jî ku berhemên gundiyan lê dihatin komkirin, bi temamî xirab bûne, hin guleyên topan ên neteqiyayî jî li nava ambaran mane.
Mal û dikanên gundiyan jî ji ber êrişan zirareke mezin dîtine.
Welatiyek ji pêkhateya Ereb ku ji niştecihên gund e dibêje ku di dema topbaranê de ew ji lingê xwe birîndar bûye.
Dayikek jî zarokên wê li dorê kom bûne û nan çêdike, dibêje ku ji ber tirsê xew bi çavên zarokan nakeve, hesreta wan jiyanek asayî ye.
***ANHA***

## Êrîşa li ser Sûrî wê bi erêkirina Rusya û DYA`ê bibe



**Zekî BEDRAN**

Dewleta Tirkan li hember bakûrê Sûrî, ji bo seferek nû ya dagirkirinê amadekariyek mezin dike. Bi taybet hewl dide ji Rusya alîkarî bigre û bi erêkirina wan vê yekê pek bîne. Gel hemû, civaka Sûrî dixwazin şer xelas bibe û birîn bên pêçandin. Tirkiyê berovajî vê yekê hewl dide birînên nû veke û bi sedhezaran kesan koçber bike û rewş xirabtir bibe. Ji bo Kurd tinebin, statûyeke wan nebe dixwaze hemû cîhanê rake ser piyan. Kesên nizanibin ewê bêjin qey Kurd hember dewletê Tirkan pir xerabî kirine, hewldana dagirkeriyê kirine! Li Rojhilata Navîn herî zêde Kurd li nava sînorê Tirkiyê jiyan dikin, li wir jî Kurd heta niha Tirk tên hesibandin. Di destura bingehînde wiha hatiye pênase kirin. bi zimanê dayîka xwendin qedexe ye. Polîtîkayek asîmîlasyonê sîstematîk tê meşandin. Kurd ev sed salin bin polîtîkaya îmha û înkarêde jiyan dikin. Dixwazin di nava hebûn û netevbûna Tirk de bihelînin. Di nava penceya qirkirina çandîde ne. Lê li başûr û rojavayê Kurdistanê de Kurd bi zimanê dayîka xwe perwerde dibinin, çanda xwe jiyan dikin û bûn xwedî nasname. Tirkiyê vê yekê ji bo xwe xeterîyek mezin dibîne.
Di nava axa Sûrî herêmeke bi kûrayî 30 km. weke herêma ewlekarî îlan dike. Dibêje, ewlekariya sînorên Tirkiyê bi dagirkirina axa Sûrî û Irak`ê ezê pêk bînim. Her wiha dibêje, 'başûrê Tirkiyê bûye koridora terorê, DYA 4-5 hezar TIR çek û cebilxane daye YPG,' ev qêrînên wan hemû ji ber îhtîmala jiyankirina Kurdan li Sûrîyek demokratik e. Ew rastiye ku Tirkiyê weke xeteriyek mezin bi cîhanê dide nişandan. Ew 30 km. herêma ewlekarî jî herêmên Kurd jiyan dikin e. Demên berê rêjîma baas bin navê 'kembera ereban' de li herêmên Kurdan gelê ereb bi cîh kiribûn. Dixwastin helandin bi lez bikin, hebûna Kurdan kêm bikin. Dewleta Tirkan jî dixwaze 'kembera ereban' jî derbas bike, herêmên bê Kurd ava bike. Di bin pênase û edebiyata Teror de qirkirina netewî û jenosîd heye.
Tirkiye Efrîn dagirkir. Qey li wir PKK û YPG ma ne? Na, ti rêxistineke Kurdan nehêştin e. Lê tû li dewleta Tirkan binerî, dibêjin ``bi Kurdan re û dewletan re pirsgirêkê me nîne, hedefa me terorîstin`` Ger pirsgirêka we bi Kurdan re nîne, çima gelê Efrînê nikarin vegerin cîhê xwe? Yên ku li Efrin'ê mabûn jî mecbûr man reviyan. Hemû mal û milkê gel dest danîn ser û talan kirin. Heman tişt li Girê spî û Serêkanî jî hat dûbarekirin. Erdogan niha jî dibêje 'ezê Rojava hemû paqij bikim divê Kurd li wir nemînin'. Rastiyê ku li meydanê tê jiyankirin eve. Divê ev yek baş bê fêmkirin û bi cîhanê re baş bê şîrovekirin.
Niha hikûmeta Tirkan ji bo operasyoneke bejayî şert û merc gûncav dibîne. Lê destek û erêkirina DYA û Rusya nebe nikare operasyoneke dagirkirinê pêk bîne. Ji bo şer berî hemûyan divê qada esmanî vekin. UN û hemû hêzên navnetewî yên din rûxmî hemû xwastek û hewldanan biryara 'qedexeya esmanî' negirt. Salên 1990'î de li hember êrîşên Saddam qada esmanî hate qedexe kirin. Kurdan wiha karîn vegerin li ser welatê xwe û hebûna xwe domandin. Niha êrîşên Tirkan çend kat Saddam derbas kirine. DYA, Ewropa û Rûsya naha li Sûrî ne û çawa bi dijminayîyek bê sînor êrîşê Kurdan tê kirin, dibînin. Lê hember van êrîşan nasekinin. Pêşiya êrîşên li Girê Spî û Serêkaniyê Pûtîn û Ruhanî çobûn Enqerê. Erdogan alîkarî û destek ji van girt û pişt re êrîş kir. Her wiha Trump leşkerê DYA ji herêmê nekişanda cardin nedikarîn êrîş bikin. ji xwe li Efrîn`ê jî Rûsya qada esmanî vekir û ji bo Tirkiyê rê vebû. Niha jî rewş pir cûda nîne. Erdogan ji bo Putîn amûrekî hêsan yê bi karanînê ye. Di şerê Ukrayna ketîne tangasiyekê. Erdogan jî dixwaze vê firsendê binirxîne û ji bo şerê li dijî kurdan ji Rusaya yê destek bigre. Li bazar wer xwûyaye ku Putîn bi Erdogan re li hev kiriye. Wiha neba Erdogan nedikarî êrîşeke wiha bike. Erdogan axa Sûrî dagir dike, dagirkirinê jî bes nabîne, qirkirina netewî pêk tîne. Çi kare Erdogan li Sûrî heye? Kes wî venexwendiye. Sûrî dewletek endamê NY ye. Axa welateke din weke herêma ewlekarî îlankirin, li dijî hiqûqa navnetewî ye. NY, DYA û Rûsya tenê vê serweriya qanûnê ya di rêzê de jî deynin pêşiya Tirkiyê, ew nikare gavek tenê bavêje.
Rûsya hemû hesabên xwe li ser rêveberiya Şam`ê çêkiriye. Ji xwe polîtîkayeke wê li ser Kurdan nîne. Li Rojhilata Navîn polîtîkayeke Rûsya ya çêker hebaye, wiha tevnedigeriya. Rûxmî ku Kurd û herêma xweser dizanin ku Rûsya dixwaze rêveberiya Şam`ê biserbixîne, cardin jî navbêynkarî û rol leyîstina Rûsya qebûl kirin. Rûsya li şûna ku vê rolê bileyîze, wekî ku li Sûrî çi pirsgirêk nîne, nakokî nehatine jiyan kirin hewl dide ku cardin herkes tevlî rrejîma Şam`ê bibin û pirsgirêkên gel neyên çareserkirin û dîtin. Kurd kêm mirine an zêde mirine, ji axa xwe hatine derxistin an na, ne girînge. Rûsya dixwaze, Erdogan`ê faşîst ê ku Sûrî hilweşandiye li ser piyan bigre. Dibêje, 'Tirkiyê beşek din ya Sûrî dagir bike û bi balafiran lê bixe û hilweşandin hinek din zêde bibe, ma ewê çi bibe'!
Dûbare dûbare em bêjin Rûsya, bi Erdogan re li hev neke, li hember Sûrî sefereke din ya dagirkerî çênabe. DYA jî bêje na, Tirkiyê nikare êrîş bike.